

BANGEWAZÎYA BI GIŞTÎ

ÇARŞEMA 14'Ê HEZÎRANA
2023'YAN

GREVA
FEMÎNÎSTÎ



Weke gelek welatan me jî li Swîsreyê ji bo wekhevîyê li dijî zayendperestî û ciyawazîyê çalakî li dar xist. Piştî greva dîrokî ya 14'ê Hezîrana 2019'an me ti tişt bi dest nexist, ji ber wê em ê **14'ê Hezîrana 2023'yan grevekê nû li dar bixin.**

Em ji bendemayînê westiyar: 42 sal di ser dengdayîna gel re derbas bûn ku ew ji bo xala makezagonî ya wekhevîyê bû. Ev 27 sal in ku Zagoneke me ya Wekhevîyê heye. Lê belê hê jî heq û mehaneyên me yê malnişîniyê kêm in û pirrê caran di asta xizanîyê de ne. Sedema xebata me ya nîvzemanî, dudu ji sisêya karkirina me ya karên malê, perwerdehî û lînêrînê ye: karên malê yê weke xwarinçêkirin, firaxşuştin, lînêrîna zarok, nevî, xizm û yextiyaran. Ev karên li Swîsreyê bêpere ne, lê gelekî berhemdar in. Divê qîmetê van karan werin diyarkirin!

Em ji helwesta zayendperestî û hemû cureyên tundîtiyê kerixîn. Em dixwazin bêyî tirsê lêdanê bijîn, bêyî tirsê destavêtinê bixebitin, bêyî tirsê îstîsmarê biçin malên xwe. Rêzgirtina li hemberî beden û jiyînê me, tê wateya dawîanîna hemû tundîtiya li hemberî jin û mirovên zayendcuda û naskirina mafên biryardarîya me ya serbixwe.

Rengên çermên me, çanda me, kok ango olên me; pasaporta me, zayendhezîya me ango cinasê nasnameya me, temen û statuya me çî be jî em dixwazin civakeke xwedî piştevanîya wekhevî, bêtundî, nezayendperest ava bikin.

Ji ber van sedeman, em ê 14'ê Hezîrana 2023'yan grevê li dar bixin.

Greva me wê gerdûnî be : li cihê kar û li malê. Ew ê li gora şert û şirûtên me pêk were: ji dêvla kelîyekê yan hemû rojê em destên xwe di bin çengên xwe xin, em ê zîvêr bikin, em ê bi şev û rojê qada gelwarî dagir bikin! Greva me ne li dijî mêran e, ew ê li dijî pergala dembihurî ya baviksalarîyê be. 14'ê Hezîrana 2023'yan wê mêrên piştevan jî ji bo piştgirîyê werin vexwendin.

Bi kollektîfa (koma) herêma xwe re pêwendiyê çêkin

info@gregefeministe-vd.ch

gregefeministe.riviera@gmail.com

gregefeministe.nyon@gmail.com

gregefeministe.renens@gmail.com

@gregefeministevaud



Grève Féministe Vaud



www.gregefeministe-vd.ch